

Çima Ziman Pêwist e ?

Dilovanê Deştê

Ji hebûn û berdewamiya jiyana gelan re, ziman yek ji hêmanên bingehîn e û ji ber vê yekê jî, zimanhez û zimanzan, bi giranî û bi rengekî zanistî, li ser şirovekirin û danasîna ziman rawestan e. Wan ziman wekû yek ji hêmanên bingehîn yên avakirina netewan dane nasîn. Ziman ne tenê gringtirîn hêman e, lê belê ew bi xwe hebûna netewan e. Ji bo ev bê nasîn, pêdiviyê ku em zanibin ziman çi ye , û kengî tê pêkanîn.?

Ziman, wekû zimanzanan daye nasîn, alava peywendî û têkiliyê ye. Bi zimên, mirov dikare hest û ramanên xwe bigihîne herkesî, her wiha jî, ew bîr, raman û bîranînên mirov ji windabûnê diparêze. Bi vî awayî ziman, ji aliyekî ve, ji bo parastina kelepûr û kevnetor kewar e . û ji aliyekî din ve, ew nasnameya netewan ji windabûnê û têkçûnê diparêze. Lê, li hemberî vê jî, windakirina ziman, windakirina mafên mirov e. Çunkî ew mafên ne bi zimanê xwediyên xwe bêne xwestin û daxwazkirin, qet nayên bi destxistin û ew winda dibin.


Hêjayî gotinê ye ku her zimanek nîşana hebûna neteweyekî ye û çand û wêjeya wî nîşan dide û diparêze, ango: Milet bêziman nîne û ziman jî bê millet nîne. Bêguman, wêje yek ji alavên avakirina mirovan û sazkirin û dûzkirina rewşa civakan e. Lê pir pêwîste em zanibin ku hebûna wêjeyeke xurt û pêşketî bi hebûna gotinên xweş û rastgo ve girêdayî ye, yên girêdana wan bi hev ve li gorî rêzik û bendên rêzimanêke bi rêk û pêk tê pêkanîn e. Wêjeyeke wisa wê pir giranbûha û bi rûmet be û wê di pêşxistina gelan de xwedî rol û bandoreke xurt be.

Bêguman, neyarên rastiyê û peyva azad têgiha ne, ku çand û wêje, di jiyana gelan de roleke sereke dilîze, lê ji qaftengî û nezaniya xwe, ew hewl didin ku ji bilî zimanê xwe pê ve tu zimanên din jîndar nebînin. Ew ji bîr dikin ku, ev kar karekî nemirovane ye, tenê di yasaya daristanê de cî digre. Ji ber wilo jî, ew qanûn û yaseyên awarte, li gorî nijadperestiya xwe, bi zanebûn dihûnin û ji bo qedexekirina zimanên din dixebitin. Rast e, ew nikarin zimên bikujin û

ji rakin, lê belê riyêke tenê jê re vekirî holê dimîne, ew jî rîya vejîn û xweparastinê ye. Lê, çendî ew zimanê me qedexe bikin, rêl û keleman di rîya pêşketina wî de biçînin jî, çiqasî û biqurmiçînin, ewê ji nû ve kat bide, bibe qurs û bejna xwe bilind bike. Di bawerîya min de, girînge em baş vê rastiyê zanibin û em bi zimanê xwe yê mak bixwînin, binivîsin û biramin. Pir pêwist e ku, em bi zimanê xwe rabin, rûnin, bixwin, bipeyîvin, kar bikin, bikenin û bigirîn, Lê em bi hemî zimanên cîhanê re aşîxwaz û demokrat bin.

Helbestvanê Kurd ê navdar Mele Nûriyê Hesarî jî ji nav me bar kir

Roja Şêşembê 25.01.2011anZ, helbestvan û zimanzanê Kurd ê navdar seydayê **Mele Nûriyê Hesarî** li bajarê Ç bi temenê 77 salî çû ber dilovaniya xwedê. Bi beşdariya birek ji rewşenbîr, welaparêz, hezkerên zimanê Kurdî û nûnerên tevgera welaparêz a Kurd li Sûriyê, di mzelê Qidûr Begê de cendekê wî yê pîroz hate veşartin.



Seydayê mele Nûrî, ji helbestvanên kilasîk e, hevriyê seydayê Cegerxwîn, mele Ehmedê Palo, mele Ehmedê Namî û seydayê Tîrêj e. Wî helbestên xwe bi zimanekî kurdî ferhengî ristine. Dilê wî yê mezin bi evîna welêt hatiye daxdan û birîn bûye, bi fixan û bi nalîn li ser derdê gel û welatê xwe Kurdistan rondik barandine.

Du dîwanên wî yên helbestê hatine çapkirin û gelek destnivîs li şûn xwe hiştine.

Bila serê malbata wî, hezkerên wî û rewşenbîrên Kurdî sax be.

Xwedê wî bibexşîne û cihê wî buhuşta rengîn be!